



Li dijî dagirkêri û mêtîngehkarîyê

## BERXWEDANA HERÊMÊ YA GELAN



Darfeta herî mezin a parastin û pêşdebirina şoreşa me ya Rojava ev tevgerên gel ên ku wê bi armanca desthilatdarîya şoreşgerî pêş bikevin û tevgera wan e. Çarenûsa hemû parçeyên Kurdistanê û gelên bindest ên hemû herêmê bi hev ve girêdayî ne. Rojavaya me di nava vê yekitîya çarenûsê da bi hebûna xwe ya şoreşger îlhamê dide gelan û kirdeyên şoreşger.

Di serî da Kurd, Ereb, Tirk, Fars, Azerî, Belûc, Asûrî, Ermenî, Sûnî, Şîî, Îzidî, Elewî û Keldanî hemû gel û bawerîyên bindest divê enîya berxwedanê ya li dijî emperyalîzm û li dijî mêtîngehkarîyê ava bikin.

Divê li dijî emperyalîzma DYE, sîyonîzma Îsraîl û dewletên herêmê yên paşverû karibe têkoşîneka yekbûyi ya şoreşger-demokratîk pêş bixe.

Ji bo alozîya ku ji alîyê emperyalîstan ve hatîye aferandîn veguhere alozîyeka şoreşgerî, em li her qadan li ber xwe bidin. Werin em rêxistinbûna xwe di refêن şoreşê da mezin bikin. Em lezê bidin amadekarîyê xwe. Em ji hêza xwe bawer bin.

Serdem helwesteka şoreşgerî ya zelal, li ser derfetên şoreşgerî, bi hêza taktîkî ya biliind dixwaze.

2 NERÎN:

Li Rojhilata Navîn Rewşa Nû û Derfetên Şoreşger

4 ROJEV:

30emîn Salvegera  
Pêşengê Komunîst Hate Pîrozkirin

3 JIN:

Li Dijî Tundîya Mêr  
Bi Rêxistin Bibe

7 NIRX:

Dagirtina Cihê Ji Nemiran  
Vala Bûye

# Li Rojhilata Navîn Rewşa Nû û Derfetên Şoreşger

Gelên Kurdistan û Filistînê du gelên qedîm ên Rojhilata Navîn in. Ketina sedsala 20emîn a her du gelan jî cuda ye. Kurdistan, ji destpêka sedsalê da jî bê dewlet e. Hatîye parçekirin û înkarkirin. Rastî qetîlam û bişavtinê (asîmîlasyon) hatîye. Filistîna ku dîroka wê xwe dispêre berî sedsalan, bi belavbûna împaratorîya Osmanî ra di sala 1922an da weke komara mandater di komeleya Mîletan da tê naskirin. Ji salên 1920an pê ve ji cihêن cuda yên cîhanê Cihûyan (Yahûdî) bi awayekî girseyî dest bi koçkirina ber bi axên Filistînê ve kirin. Di salên 1930î da Cihûyan dest bi daxwaza mafa li ser axên Filistînê kirin. Di sala 1948an da jî bi piştgirîya Dewletê Yekbûyî yên Emerîkayê (DYE) û Îngilistanê dewleta Îsraîlê hate avakirin.

Dewleta Îsraîlê ya ku li ser axên Filistînê hat avakirin, axên Filistînê dagir kir û axên xwe berfirehtir kir. Nexşeya siyasî ya destpêka sedsala 20emîn hema mabû guherîye, ji tunebûnê dewleteka Îsraîlê hatîye afirandin û hewla tunekirina dewleta Filistînê hatîye dayin. Hem gelê Filistînê hem jî neteweya Kurd li dijî sîyaseta mêtîngehkar ên li ser axên xwe têdikoşin.

Hem du netew jî li dijî sîyasetenê mêtîngehkarîye têdikoşin. Helbet di dirêjahîya dîrokê da, helwestên bîrdozî-siyasî yên hêzên çekdar ên pêşeng ên her duyan ji hev cuda bûne. Xisleta (karakter) şoreşger-demokratik yê hêza pêşeng a tevgera neteweyî ya Kurd dîyarker e. Serkêşîya têkoşîna rizgarîya neteweyî ya Filistînê ji kirdeyên şoreşger-demokratik derbasî kirdeyên İslâm yên siyasî bûye. Lê her ku giranbûna nîra mêtîngehkarîye hem li ser Kurdistanê, hem jî li ser Filistînê berdewam kirîye têkoşînê jî berdewam kirîye.

## Reqabeta Emperyalîst, Dewletê Paşverû yên Herêmê û Şer

Rojhilata Navîn di destpêka herêmênu ku lê têkoşîna serdestîyê lê herî tûj tê jiyan tê. Li Rojhilata Navîn serdestî, dikare li ser rîyên derbasbûnê yên daringan bi avakirina serdestîya ser erd û deryayan gengaz bibe. Ji DYE heta Îngilistanê ji Rûsyayê heta Sînê armanca dewletên emperyalîst destdanîna ser kontrola van rîyan e.

Împaratorîya Faris (Ecem) û Osmanî ku heta sedsala 20an li herêmê serdest bûn, neçar man ku xwe bi dewletê Tirk û Îranê teng bikin. Lê di xeyalê wan da û stratejiyên wan ên "kûr" da her tim rojekê ji nû ve vegerîna demên xwe yên împaratorîye hebû. Her ku derfet dîtin bi hêviyê tevgerîyan û hemle çekirin. Tirkîye di Projeya Rojhilata Navîn a Mezin a DYEyê da wek modêla sunî ya nerm cih girt. Di heman heyamê da Îranê Mihwera Şîîyan li herêmê ava kir. Rûsyayê bi hedefa emperyalîst a gihaştina Behra Spî û Kendavê, Sînê jî bi hedefa emperyalîst a "kemberek û rîyek" tevgerîyan. Li Rojhilata Navîn a ku jî alîyê enîyên mezhebi yên Şîî-Sunnî ve hatîye parçekirin, li gorî armancê xwe piştgirî dan mihwera Şîî ya Îranê.

Li dijî siyonîzmê teva hemleya Tofana Eqsayê ya ku di 7ê Cotmeha sala par hemû enîyên ku li Rojhilata Navîn ketin tevgerê. Îsraîla ku bi piştgirîya eşkere ya DYE, Ewropa û Erebîstanâ Siûdî li Xezayê wêrânî û qirkirineke mezin pêk anî û ev pêvajo hîna didome. Piştî kuştina rîberê Hizbulahê Hesen Nasralah, birîndarbûna bi hezaran milîtanên Hizbulahê ya bi teqandina cîhazên bangewazîyê êrîşeke nû ya dagirkerîyê li Lubnanê hat destpêkirin. DYE û Îsraîl bi perçiqandina gelên herêmê hewl dide ku Îranê dorpêc bike tevli şer bike.

Îrana ku bi xisleta xwe ya mêtîngehkar e, bi destê rejîma Melelî bi darê darvekirinê derdikeve hemberî daxwaza azadîya politîk, weke aborî di qeyranê da ye. Îran jî dizane ku eger bikeve şerekî wiha dê parce bibe. Lewma jî rasterast nakeve şer. Lê ew tê kişandin nav şer.

Hizbulahê bi zanyariya xwe ya şer û taktîk, bi tecrûbe ya xwe ji bo parastina rejîma Sûriye roleka girîng lîst. Li sehaya Surîye di esasê da li dijî tevger û rîexistinê ku di xeta Îhvanê da şer kir. İro jî di sengerên krîtik da bicibûna xwe didomîne. Lê ji ber êrîşen dagirkerîyê yên Îsraîlê, Hîzbulah neçar ma ku beşek ji hêzên xwe vekişînê. Çeteyên ku li Idlip û Ezazê, ji bo sûd jî vê rewşê bigirin ketin tevgerê. Lê di heman demê da di hundirê xwe da jî di nava pevçûneke da ne. Dewleta Tirk hewl dide ku ev çeteyên ku diparêze xurt bike, dixwaze rewşê kontrol bike. Di fikarê hemleyeke li dijî Serê Kanîyê, Efrîn û Girê Spî yên dagirkirî da ne. Îrana ku lawaz dibe, ji bo mayîndefîya rejîma Esad rewşeka nû ye. Her wiha Îsraîl li Şamê jî dixe. Hedefa wê ya niha ne rejîma Şamê ye, lê Esad di kursiyê xwe da qet ne rehet e. Bi kurtası Rojhilata Navîn careka din tam di nav aloziyekê da ye.

Şam û Îrana ku lawaz dibe, dikarîbû ji bo dewleta Tirk bibe derfetekê. Lê nikare bibe, ji ber ku dewleta Tirk dewleteka faşîst û mêtîngehkar e. Îrana ku lawaz dibe, ji bo Kurdên Rojhilat, Belûcî û Azerîyan dikare bibe derfeta mafa çarenûsê, ji bo gelên Faris (Ecem) jî di têkoşîna azadî û wekhevîyê da dikare bibe heyameka nû. Heman tişt ji bo

destxistina statûya Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûrî dikare bizivire derfetekê. Ev hemû geşdan dikare derfeta hemleyeka şoreşger pêşkeşî gelên Bakurê Kurdistan û Tirkîye jî bike. Di parlamento ya Tirkîye da girtina destê parlementerên partîya DEM a serokê partîya faşîst a MHPê û gotina "pêwîst e em enîya hundirîn xurt bikin", nîşandayina Îmrâliyê vegotina tirs û fikaran e. Tirs û fikar mezin e. Ji ber ku têkoşînêka azadîya Kurd a mezin û tevgera şoreşger a Tirkîye ku li ber xwe dide û çavkanîya vê tirsê pêk tîne heye.

Çawa ku di şertên serhildanê gel ên Ereb da Rojava şoreşer xwe li dar xist û ji gelên herêmê ra bû çavkanîya hêviyê, dê di vê heyamê da jî mişraqênen nû yên berxwedanê yên şoreşger hebin. Li Tirkîye bi serhildana Heziranê (Gezî) û Kobanê û li Rojhilat û Îranê ji tecrûbeyen tevgera "Jin Jîyan Azadî" rastîyeka gel heye. Divê tevgerên komünîst-şoreşger ên gelên Îran, Tirkîye û Kurdistanê van şertan binirxînin, amadekarîyen xwe bileyînin.

Derfeta herî mezin a ku şoreşer me ya Rojava biparêze û hîna zêdetir bi pêş ve bibe, ev tevgerên ku bi pêş bikevin in. Divê ev tevger bi hedefa desthilatdarîya şoreşger tev bigerin. Çarenûsa hemû parçeyen Kurdistanê û gelên bindest ên herêmê girêdayî hev e. Rojavaya me, di orteya ev yekîtiya çarenûsê da bi hebûna xwe ya şoreşger hêvî dide kirdeyên şoreşger û gelan.

Divê Kurd, Ereb, Tirk, Azerî, Belûcî, Suryan, Ermen, Şîî, Îzidî, Elewî, Keldanî û hemû gelên bindest û bawerî mihwera antiemperyalîst, antîmêtîngehkar ava bikin. Divê li dijî emperyalîzma DYE, Sîyonîzma Îsraîlê û dewletên paşverû yên herêmê têkoşîna yekbûyî ya demokrafîk-şoreşger pêş bixin. Ji bo ku em karîbin aloziyâ ku emperyalîstan afirandîye bizivirînin aloziyekâ şoreşger di tevahî enîyan da berxwedanê rîexistin bikin. Em di refîn şoreşger da asta rîexistinbûnê bilind bikin, lez bidin amadekarîyen xwe, em ji hêza xwe ya cewherî bawer bikin.

Pêwîstîya vê heyamê bi helwesteka şoreşger ku behremendîya xwe ya taktîk bilind e û giranî dide derfetên şoreşger heye.



Taybetmendîyêن biyolojîk, fizyolojîk û genetîkî yên ku mirov hîna dema welidînê da xwedî wan e weke zayend têن pênasekirin. Lé zayenda ku mirov di destpêka welidînê da xwedîyê wê ye, di civaka serdest a mîr da berpirsiyartî û rolên ku jê têن xwestin cûda dike. Di civaka ku em tê da ji dayik dibin da hîna ji zaroktîya me da pêwîstîya ku jin û mîr dê çawa tev bigerin an jî tevnegerin tê vegotin. Cudatî têن fêr kirin. Têgîna zayenda civakî, berpirsiyartî, erk û rolên cuda ku li mîr û jinan tên barkirin ifade dike.

Di her civakê da, ramana ku rolên zayenda civakî ji dema welidînê da têن û nayêñ guhertin heye. Tê xwestin ku newekhevîfîyêñ ku ji cudatîyêñ rolê yên di navbera zayandan da derdikevin, bêpîrs bêñ qebûlkirin. Civaka serdest a mîr, ferzî jinan dike ku ew bêyî ku li dijî vê derkevin cihê xwe ya di rêza duyem da qebûl bikin. Bi vî awayî rê li ber tundîya mîr a li ser jinê tê vekirin.

Tundîya li ser jinê, di hundirê malê da an jî derveyî malê, ji her cure gef û nêzikaftîyêñ ku xwe dispêre newekhevîfîyêñ zayendî yên civakî û ramana ku jin di rêza duyem da ne pêk tê. Tundîya li ser jinê ji bo berdewamîya avahîya kokdar a baviksalar ku civakê dişikilîne, berdewamkirina bendawarîya jinê bi mîr ra û talibûna jinê armanc dike. Yek ji taybetmendîyêñ herî bandorker a vê pergalê stratejiya ku jin di nava demê da tundîyê bi asayîkirinê qebûl dike û berdewamîya ev pergalâ ku xwe dispêre tundîyê dabîn dike ye. Tundîya li ser jinê; her cure çalakîyêñ wekî fizikî, derûnî an jî aborî yên ku êş didin jinê ne. Niha em fêr van cureyêñ tundîyê bibin.

### TUNDÎYA FIZİKÎ

Her cûre behreyêñ ku bi têkilîya rasterast ve têne pêşandan, bikaranîna tiştîn wekî, wesayît, ajal, an serwerîya li ser bedenê, bi zimanê bedenê tehdîtkar tevgerîn, denga bilind û bi tevgerên serdest têne destnîşan kirin. Bi kurtasî, ev her cure êrîşa li dijî bedena me ye.

Şêweyêñ tundîya fizikî yên herî zêdetir tên dîtin ev in: kuştin, dehfdan, lêdana şîrqaman, lêdan bî pêhnan, xistin, kulm lêdan, kişandina por, zivirandina pî, guvaştina stû, girêdan, avêtina tiştîn hişk, bi tiştîn birînê lêdan, birîndarkirin an jî bi madeyêñ sofîner ên wekî ava kelandî, kezab, cixare û hwd. zirardayîna bedenê, bi astengkirina sûd girtina ji xizmetêñ tedurîstîyê zirar dayîna bedenê, mecbûrhiştina jîyana di şertîn netendorist da, mecbûrkirina intiharê, bûyîna sedama xistina zarok, qufilandina di cihekî da, tena hiştina di cihekî xeter da û beranber hiştina bi tiştekî ji ditirse ve.

### TUNDÎYA DERÛNÎ

Tundîya ku weke tundîya hîsî jî tê navandin şopêñ ku bi çavan têñ dîtin nahêle. Lé nayê wateya ku ev ne girîng e. Ji ber ku di tenduristîya rihî û hestan da şopêñ kûr dihêle.

Şêweyêñ tundîya derûnî ya ku herî zêde têñ dîtin ev in: qarîn, heqaretkirin, xeberdan, bîçûkxistin, şermandin, qutkirina gotin, tînazkirin, navêñ ku bîçûk dixe lêkirin, bi armanca kontolkirinê

## Li Dijî Tundîya Mîr Bi Rêexistin Bibe



pêşwazîkirin an jî pêşwazînekirina pêwîstîyêñ hîsî yên wekî hezkirin, eleqederbûn, zirardayîna jinê an jîderdora wê, gefxwerina bi revandin an jî kuştin, neaxivin, bersiv nedan, bîryardayîna li ser cilîn jinê, bîryardayîna cihêñ ku jin biçe û bi kê re hevdîtin çêbike, kontrolkirina cihê wê, têde lêkirin, berawîrdkirina bi jinêñ cuda ra, bi sedema hesudîyê her tim kontrolkirin. Sînordarkirina têkilîyêñ jinê, bûyîna sedema tena mana wê, weke berpirsiyârê tundîyê dîsa sûçdarkirina jinê, di mijarêñ wekî pêşketina zarakan da astengkirina bikaranîna mafa gotina jinê, tevlînekirina mekanîzmayêñ bîryaran, tune hesibandina mafêñ şexsî, her tim rexnekirin û bi vê rîyê rê li ber vekirina ku jin xwe her tim lawaz, bêzar, hewcedar û bedewar bibîne, bi navê jinê bîryardayîna tiştîn baş an jî nebaş, înkarkirina gotin an jî gotin an jî tevgerên xwe.

Mîrê ku tundîya psîkolojîk ferzî jinê dike; dikare her tiştî ku kirî an jî sozêñ ku dayî înkarkirina. Israr dike ku rewş ne wiha ye, an jî idîa dike ku ji devê wî axaftineka wiha derneketîye. Bi ser da jî dikare ji bo ku we ji niyeta wî guman kirîye we sûcîdar bike.

### TUNDÎYA CINSÎ

Ji alîyê mîrekî ku nas an jî nenas ve bêyî daxwaza jinê nîşandayîna helwestêñ gotinî an jî çalakîya pratîkî ya cinsî ye.

Ji bo ku em tundîya cinsî vebêjin em dikarin li van mînakîn binêrin: Li cih û demeka ku jin naxwaze da ji bo têkilîya cinsî zor li jinê kirin, henek û pêşnîyârêñ li ser cinsîtîyê, bikaranîna amûrêñ dîtbarî, bi rîya devkî an jî fizikî tacîzkirin, tecawîzkirin, rewşen ramûsandin an jî ferikandinêñ ku nayêñ xwestin, ferzkkirina pozîsyonêñ cinsî yên ku jin naxwaze, bi zanebûn nebihîstina gotina "Na", zirardayîna organê cinsîtîyê. Bi awayekî ku jinê û bedena wê bîçûk dixe û berawîrdkirina bi jinêñ cuda ra. Zor lê kirina welidandina zarok an jî kurtajê. Kişandina dîmenêñ jinê yên tazî, cinsî û tehdîtkirina bi belavkirina van dîmenan.

Bi zorê ferzkkirina karkerîya seksê, ferzkkirina zewaca bi zorê û zewicandina di temenê bîçûk da.

### TUNDÎYA ABORÎ

Bi rîya tundîya aborî jin ji derfetêñ

aborî yên ku ji bo debarê pêwîst in pêpar têñ hiştin, çavkanîyêñ aborî weke danekirin, gef û amûrekî kontrolê li ser jinê tê bikaranîn.

Mînakêñ herî zêde ev in: Astengbûna li ber xebitîna jinê an jî ferzkkirina xebitîna di karekî ku jin naxwaze da, dest danîna ser qezenc an jî milkê jinê, nedayîn an jî sînordar dayin. Kêm pere dayin û li hêviya gelek tiştî bûn, derheqê mijarêñ ku malbatê eleqedar dike da tena bîryardayîn, di kargeha jinê da bi derxistina pîrsgîrêkan bûyîna sedema hatin avêtina jinê ya ji kar, tadekirina di mijara standina mîras an jî dîewrkirina wê da.

Li ser jinê dabînkirina tundîya aborî, armanc dike ku jin nebe xwedîyê gotin, xwe xurt hîs neke û nikaribe li ser pîyan bimîne. Jin muhtacî mîr dimîne û bi vî awayî mîr dikare zordarîya xwe berdewam bike.

Divê tundîya mîr, di pergalâ baviksalar da weke helwesteka ku di pergalâ baviksalar da desthiltdarî û kontrolê dabîn dike were girtin dest. Di têkoşîna li dijî serdestîya mîr da sererastkirinê hiqûqî, civakî, siyasî û aborî yên ku karibe bendêñ civakî pêk bînîn girîng in.

Rêveberîya Xweser li dijî vê sererastkirinan çedike. Lé divê em hemû jin gotina "na" ya li dijî tundîya ku em pêra rû bi rû dimînin bizanîn.

25ê Mijdarê roja têkoşînê ya navneteweyî ya li dijî tundîya li ser jinê ye. Têkoşîna me di heman demê da ji xwişkêñ Mîrabel ên ku li dijî tundîya mîr-dewletê li ber xwe dane hêz digire. Sê Xwişkêñ Mîrabel Patrîa, Mînerva, Marîa Teressa ên ku li Komara Domînîkê li dijî dîktatorîya Trûjîlo li ber xwe dan li dijî zilmê serî netewandin. Ji alîyê dîktatorîya Trûjîlo ve di 25ê Mijdara 1960an da pişti ku hatin tecawîzkirin hatin qetilkirin. İro em bi hezaran xwişkêñ wan di rîya wan da dimeşin û têkoşînê mezin dîkin.

Em di 25ê Mijdarê da li dijî tundîya mîr qadan dadigirin. Tu ew kesê ku vê nîvisê dixwînî, di ev rojêñ ku em şerê zayendî dijîn da li dijî tundîya li ser jinê dem dema kirdebûyînê ye. Dem dema cihgirtina di refen Jinêñ Komunist ên Şoreşger da û dema di 25ê Mijdarê da mezinkirina têkoşînê ye.

# 30emîn Salvegera Pêşengê Komunîst Hate Pîrozkirin

Komunîstên Rojavayî, ji bo pîrozkirina 30emîn salvegera pêşengê komunîst li Dîrbêsiyê, Kobanê, Qamişlo û Hesekê şahîya lidarxistin. Di şahîyan da ji çîna karkeran, jîn, ciwan û gelên bindest ra bangewazîya têkoşînê hate kirin. Di axaftinê ku hatin kirin da hate tekez-kirin ku komunîstê pêşeng ruxmê hemû êrîşen tesfiye meşa xwe bi biryardarî dide meşandin.



**DÎRBÊSIYÊ-** Li Dîrbêsiyê şahîya pîrozkirina 30emîn salvegera pêşengê komunîst li saziya Tevgera Komunîst a Şoreşger (TKŞ) hat lidarxistin. Ligel malbatên şehîdan gelek kes besdârî şahîye bû. Di şahîya ku bi rêzgirtinê dest pê kir da sînevîzyonek li ser dîroka komunîstê pêşeng hat temâsekirin. Di şahîye de yek ji berdevkê TKŞê Fadya Sîdo axivî. Fadya Sîdo di axaftina xwe da bi bîr xist ku dîroka şer û têkoşîna 30 salan a pêşengê komunîst bi berdêlîn mezin hatîye afirandin. Fadya Sîdo di berdewamîya axaftina xwe da anî ser ziman ku komunîst li Başûrê Kudistanê tevî şerê gerîla û tevî parastin û avakirina şoreşa Rojava bûye. Fadya Sîdo bi bîr xist ku komunîstan di nava vê heyamê da Tabûra Şehîd Serkan, Tabûra Şehîd Sarya, Tûgaya Elîşêr Deniz avakirine û di vê pêvajoyê da gelek komunîst nemir bûne. Fadya Sîdo di axaftina xwe da li dijî mêtîngehkarî û emperyalîzmê pêwîstîya yekbûna çîna karkeran û gelên bindestan tekez kir.



**KOBANÊ-** Şahîya ku li Kobanê hat lidarxistin bi rêzgirtinê dest pê kir. Ciwanê Komunîstên Şoreşger (CKŞ) dirûşmeyan meşîyan û hatin qada şahîye. Pişti danışana sînevîzyonê axaftina vebûyînê hat kirin. Di axaftinê wiha hat gotin; "sala 30emîn a komunîstê pêşeng, bila li girtîyen ku di zindanan da li ber xwe didin, li gerîlayênu ku li serê çîyan li dijî mêtîngehkarîye li ber xwe didin û li komunîstên car alîye cîhanê pîroz be."

Xanim İbrahîma ku li ser navê TKŞê axivî wiha got; "meşa komunîstan a li Rojava bi nemir û gazîyan di bin agir da

berdewam kir. Dewleta faşîst a dagirker faşîst dixwaze vê meşe bide sekinandin. Ji ber vê suîqestêne xwe berdewam dike, sixûrên xwe dişîne nava me. Polîtikayên şerê taybet dide meşandin."

Xanim İbrahîm bi bîr xist ku yek ji fermadarên MLKPê di encama îxanetê da şehîd ketîye û tekez kir ku dê ew ala şoreşê bilind bikin. Xanim İbrahîm wiha axivî: "Bila küser nefikirin ku dê ev xwîn li erdê bimîne. Em ê tola hevrîyên xwe rakin. Em ê tiştîn ku wan fêri me kirine vala dernexînin, em ê bibin şopdarên wan." Di bîranînê da koma şagirtên Yılmaz Behrareş dîlan kirin û helbest xwendin. Di şahîya ku temaşeya aqîrbazî hat kirin da hunermend Sadûn, Derdo û koma müsîka rep stran gotin.



**QAMIŞLO-** Li Qamişlo li sala ku şahîya hate lidarxistin lafîteyên "Bijî Kurdistana Azad, Bijî Sosyalîzm", "Jin Jîyan Azadî", "Şoreşa Jinê Ne Hesan e lê Serkeftin Teqeze e" û sûretên nemirên ku di parastina şoreşê da şehîd ketine, alên TKŞ, JKŞ û CKŞ hatin daliqandin.

Di şahîye da Ekîn Îsyân axivî û di axaftina xwe da got: "weke di têkoşîna sosyalîzmê da di pêşketina pêşengê komunîst da jî roleka ciwanan a girîng heye." Fermandarê mê yê Sor Baran Serhed her tim girîngîyeka mezin dabû soza "Ciwan Pêşeroj e, Pêşeroj Sosyalîzm e". Li dijî xwîna ku gelê me rijandîye û berdêlîn giran ên ku daye divê êdî em derbasî sosyalîzmê bibin. Ekîn Îsyân da xuyakirin ku ji bo guherîna civakî guherîna mîran şert e." Ekîn Îsyân axaftina xwe wiha berdewam kir: "Hevrê Baran, bangewazîya mîran kir û ji wan xwest ku ew xwe biguherînin bibin mirov. Em vê dirûşmeya xwe nû dikin. Ger ku em dibêjin şoreşa Rojava şoreşa jinê ye divê destpêkê da mîr vê fêm bikin."

Ekîn Îsyân bangewazîya ciwanênu ku berê xwe didin Ewropayê kir û bi bîr xist

Komunîstên Rojavayî 30emîn salvegera avabûna pêşengê komunîst pîroz kir. Dirûşmeyen "Bijî Şoreşa Rojava", "Bijî Şoreşa me ya Jin" û "Bijî MLKPê hatin avetin.

Servanê Tûgaya Sor ên ku di parastina eniyê da cih digirin bi agir MLKPê nivîsandin û pîrozbaî lidarxistin. Bi zimanî Kurdî û Erebî dirûşmeyen "Ji bo Serkeftina Şoreşê Bijî MLKP" hate avetin.

Endamên CKŞê li Kobanê di dûhatîya sîrûda sala 30emîn a Kolektîfa Avekeran da bi agir MLKPê nivîsandin.

ki Firat Newal û Ivana Hoffmann ên ku dema ku li Rojava şer dikirin û di vî şerî da şehîd ketine ji Elmanyayê hatine û tevîbûnê. Di şahîya ku besadaran jî mafa axaftinê girtinê da dirûşmeyen "Bijî MLKP", "Bijî KKO" hatin avetin. Sirûda ku Kolektîfa Müsîka ya Avakeran ji bo sala 30emîn amadekirîye hate guhdarkirin û pişti vê sînevîzyona li ser dîroka pêşengê komunîst hate temaşekirin. Şahîya bi dîlanan qediya.



**HESEKÊ-** Li Hesekê li ber sazîyê hevdîtina gel hate lidarxistin. Di şahîya ku bi rêzgirtinê dest pê kir da li ser navê TKŞê Fadya Sîdo axivî û di axaftina xwe da wiha got: "dîroka 30 salan a pêşengê komunîst, li hevrîyên li çiyan, di zindanan, bajaran û tevâhî nemiran pîroz be.

Fadya Sîdo ya ku di axaftina xwe da xuyakirin ku pêşengê komunîst li gelek bajaren Rojava, di enîyan da şer kirîye axaftina xwe wiha berdewam kir: "Partîyê me gelekî berdêlîn giran da. Li dijî dijiminê faşîst tu carî paş da gav navêt. Şerê xwe heta iro berdewam kir. Dijmin rojaneyî bajaren û hevrîyên me hedef digire. Di sala 2019an de hevrê Baran hedef girt. Fermandarê me yê Sor Ehmed Şoreş, pêşengê komunîst Ferhad Erebo, Metîn Dîcle, Fîrat Newal û Yılmaz Behrareş kir hedef. Ji bo ku çin û gelên bindest ji kedxwarî û dagirkerîye werin rizgarkirin pêwîst e ku hemû karker û kedkar li dijî dewletên faşîst û kapîtalîst bibin yek û şer bikin. Ji bo Xurtkirina şoreşa me pêwîst e ku em şer bikin."

Di axaftinê din ên ku di şahîye da hatin kirin da bangewazîya mezinkirina têkoşînê hate kirin. Ciwanê komunîst bi cepikan meşek lidarxistin. Pişti axaftinan sînevîzyonek hate temâsekirin û şahîya bi dîlanan hate qedandin.



# Bi Desthilatdarîya Mêr ra Rûbirûbûna Civakî

Bi zayîna milkê taybet, rewşa ku mirov mirovan dike kole dest pê kir. Pergala civakî ya komînal, bi serdestîya zayenda mîr a li ser amûrên hilberînê têk cû. Pişti ku mirovan li ser mirovîn din serdestî avakirin, mîran destpêkê jin weke kole dîtin. Roleka civakî ya wekî ku ji bo berdewamîya nifşê zarokan diwelidîne û peydakirin û pêşwazîkirina her cure pêdîwîyên mîran hat ferzî jinan kirin. Jin hatin xistin bin zordarîyê (tehekûm). Zor li wan hat kirin ku serî bitewînin. Mîran derheqê jinan da di her mijarê da standina bîryaran wekî mafa xwe dîtin. Berevajî civaka komînal, têkilîya navbera jin û mîr ji têkilîyeka ku wekhevîya zayendî esas digire derket. Mîrê ku jinê wekî "tiştê bikaranîn"ê û "milkê xwe" dibîne dûrî mirovatîya xwe ket.

Ev zordarîya ku mîr weke "kirde" û jinê jî weke "tişt" dibîne, di nav demê da veguherî pergaleka civakî. Mîr, her cara ku daxwazîn wî hat redkirin serî li cureyên tundîya zayendî ya cuda da. Demeka dirêj hewl hat dayin ku tundî bi kevneşopî û feraseta namûsê ya civakê, bi cuðatîyên herêmî, paşvemayîn û asta perwerde were ravekirin. Lî êdî van hincetan bawerdîriya xwe winda kir. Aşkere tê dîtin ku tundî di destê mîran da çeka desthilatdarîye ye.

Mîran ji bo ku karîbin serdestîya xwe ava bikin zext û tundî weke mafa xwe ya herî xwezayî dîtin. Bi nasnameya hevjîn, bav an jî xizmekî (eqrebe) cuda hewla rewakirina serdestîya mîr hat dayin. Dema ku fikirî ku di nav malbatê da guhdarîya wî nehat kirin, serî li rîbazîn wekî tecawîz, tadeya aborî, tundîya derûnî (nefsî) fizîkî û hîsî da. Ev tevgera serdest a mîr, roleka ku hemû civakê dejenere dike lîst. Ev pratîkîn serdestîya mîr, bi pêşketina kapîtalîzma ku li ser îmtiyazîn cinsî mezin dibe ra zivirî rewşeka ku tevahî civakê dirizîne. Di pergala cîhanê ya kapîtalîst a serdestîya mîr da tundîya li dijî jinê her ku cû zêde bû û li ber çavê herkesî belavî tevahî cîhanê bû. Siyaseta bêcezatî ya ku kujerên jinan diparêzin hîna zêdetir cesaret da mîran. Pergala darazî ya serdestîya mîr, ji bo ku kirdebûna jinan asteng bike tundîya mîr teşwîq kir.

Îro mîrênu ku di çar alî cîhanê da serdest in, êrîşa cinsî belavî tevahî qadêñ jîyanê kirine. Jin; li mal, li kargeh, dibistan û kolanan bi her cureya tundîye ra rû bi rû dimînin. Jin her ku li dijî newekhevîfîya ku dijîn nerazîbûna xwe nîşan didin dûçarî tundîye dimînin. Dema ku derheqê cinsîtî û pêşeroja xwe da bîryar didin an jî mafêñ bikaranîna bîryargirtina li ser bedena xwe bikar tînin rastî tundîye têñ. Dema ku dixwazin tevlî qadêñ hilberanê an jî têkoşîna politîk bibin dûçarî cureyên tundîye yêñ cuda dimînin. Dema ku bixwazin tevlî jîyanâ civakî bibin, dema ku bi şev derdikevin derve rastî tundî an jî êrîşa tecawîzê têñ. Rewş gelekî aşkere ye; her ku jin zanebûna zayendî bi dest dixin û di civakê da derdikevin pêş, mîr lawazbûna serdestîya xwe dibînin û tundîye zêde dikin.

Tundî, di heman demê da weke destkeftineka têkoşîna azadîya jinê hîna aşkere dibe. Jin radestî nézikatîya "pî dişkê di nav mil da dimîne" nabin. Tundîya dijîn parve dîkin û têkoşîna li dijî wê rêxistin dîkin.

## Mîrênu ku Derve Heval, Li Malê 'Hevjîn-Bav' in!

Dewlet hewl didin ku tundîya li dijî jinê asayî bikin. Ew, desthilatdarîyen xwe li ser ev pergala serdestîya mîr ava dîkin. Em vê heta derekê fêm dîkin. Ya ku rastî ne fehmbar, bûyîna parçeyek ji tundîya li ser jinê ya mîrîn ku têkoşîna azadîya jinê weke mafekê dibinîn û xwe weke şoreşger, demokrat, welatparêz bi nav dîkin in. Gelek mîrîn ku li der fikra azadî û wekhevîye diparêzin û weke hevala xwe ya têkoşînê nézikî jinê dibin, lî dema ku vedigerin malê jinê weke xizmetkar û milkê xwe dibînin û dikevin rola bav, hevjîn û hwd. Ev ne lihevîyeka mezin e. Mal, her ku mîr biyanî morovatîya xwe dîbe, dizivire qadeka desthilatdarîya mîr. Em nézikatîyen ku jinê dike bireser, hepsî malê dike û tundîye asayî dibînin, di van gotin û helwestan da her tim dibînin: "kevneşopîn pergala eşîrê hene, di vê pergalê da tundî misoger e", "Pêwîst e mîr lînexe lê divê jin jî cihê xwe bizane", "Li malê pirsgêrêk heye lê pêwîst e ku di nava malbatê da çaresar bibe", "Asayî ye, mafa bav an jî hevjîn e", "We azadî şas fêm kir", "Ez têm civînê lê bila hevjîna min an jî keçika min tevlî nebe", "Ez tena hatim ji ber ku li malê karê hevjîna min hebû", "Hûn ci erk bidin min ez amade me lê hevjîna min nikare bike", "Jin nikare bibe şervan", "Jin bêhêz in, alîkarî pêwîst e" û HWD. Van hevakan di jîyanâ rojaneyî da em her roj dibîhizin. Em weke van hîna zêdetir dikarin bînin ser ziman.

Gelo di nav jîyanâ rojaneyî da ji rezê dîtina tundîya ku zayenda jin rastî tê tiştekî ku bê qebûlkirin e.

Gelo em dikarin ji kesen ku li dijî tundîya li ser jinê û qetlîamîn jinê yêñ ku gihaştîye asta tevkujîye bêdeng diminîn bêjin ew mirov e? gelo kesen ku guhêñ xwe ji qîrîna jina ku nézikî xwe ra digire

dikarin şoreşgertî bikin?

## Bi Rûbirûbûna Civakî Berbestbûn!

Pergala kapîtalîst a serdestîya mîr tena ne bi îstîsmariya kedê, nîjadperestî û şovenîzmê, di mijarê wekî êrîşa cinsî ya li ser jinê û bazarîkirina cinsîtya jinê jî bi gelek çalakîyên dermirovî civakê dirizîne. Mirov ji parçebûneca civakê tê derxistin û ber bi ferditîyê ve tê kişandin.

Weke civakî rûbirûbûna bi tundîya mîr ve, wê bibe pêlikên yekem ên avakirina jîyanâ azad û wekhev. Têkoşîna azadîya jinê, wê di her qadê da bi kirdebûna jinê, bi derketina pêş a vîn û aqilê jinê pêş bikeve. Lî di heman demê da pêwîst e ku pirsgêrêk jin ên ku çavkanîya xwe ji bûyîna zayenda bindest digirin bibin rojevîn bingehîn ên têkoşîna civakî. Wê bi vî awayî vîn û aqilê jinê hîna xurtir bibe. Ji ber vê yekê, divê destpêkê mîrîn ku di nav têkoşîna şoreşger da cih digirin bi têkoşîna azadîya jin ra têkilîyên xurt ava bikin. Divê ev gava yekem mîrîn komunîst bavêjin.

Mîrîn ku xwedî hişmendîya şoreşger, di mijara têkoşîna azadîya jin da demeka dirêj bêçalakîman. Her ku hatin rexnekirin jî xwe hîna zêdetir sînordar kirin. Mîrîn Şoreşger ên Komunîst divê lêpirsîna xwe hîna zêdetir bikin û xwe nû bikin. Ger ku em dixwazin ev pergala kapîtalîst a serdestîya mîr ku jinan dike kole wê weke bireser dibîne hilweşînin, divê em têkoşîna li dijî serdestîya mîr bikin mijara çalakîya politîk. Encax bi vî rengî em dikarin vê pêk bînin. Ji bo ku em karîbin ev pergala ku mîr bi kolekirina jinê biyanî mirovatîya xwe dibe bizivirînin, divê em bi jinan ra têkilîyeka ku spartîye wekhevîya zayendî ava bikin û di rîya mirovbûnê da bimeşin. Divê destpêkê mîrîn komunîst, bi gavênu ku bi şerê zayendî ku tê jîyîn ra rûbirûbûna civakî misoger bike bavêjin û bi vî awayî bibin berbest.

Em ê nebin mîrîn ku tena eydî zayenda mîr in û xwe di ser jinan ra dibînin, wan biçûk dixin, wan di rîza duymen da dibînin û wan weke milkekî eydî xwe û weke xizmetkar dibînin.



# AN SERKEFTIN AN KOLETÎ



Em zarokên axa pîroz in. Ev ax, axa Rojhilata Navîn navenda şaristanî û destpêka dîrokê ye. Lê mixabin jîyan û mirin, koletî û serhildan, dewlemendî û xizanî li ser vê erdê tim û tim di nav şer da bûn. Zarokên vê axê, bi taybetî jî zarokên Kurdistan û Filistînê çavêن xwe ji şer ra vedikin û di şer da digirin. Nifşen ciwan ên îro yên Rojavayê Kurdistanê, zarokên şer û şoreşê ne. Ji ber vê yekê şer tu carî ne dûrî me ye.

Ligel van, şerê rizgarîya Filistînê ê ku bi "Tofana Eqsa" derbasî asta vejînê bû, di herêmê da pêvajoyeka nû da destpêkirin. Li hemberî şerê gelê Filistînê ya mafdar, Îsraîla sîyonîst bi piştgirî û hevkarîya emperyalîstên rojavayî (Dewletên Yekbûyî yên Emerîka-DYE, Yekîtiya Ewropa-YE, Birîtanya) şerekî qirkirin û dagikerîye da destpêkirin. Di hundirê salekê da zêdetirî 40 hezar Filistînî, ji zarokên di nav dêrgûşê da heta kalê 70 salî hatin qetilkirin. Ev qirkirina mirovî di bin navê şerê li dijî "terorê" da tê kirin.

Em vê çîrokê pir baş nas dikan. Wekî dewleta sîyonîst a Îsraîl, dewleta faşîst a Tirk jî rojane êrîşa gelê me dike, zarokan dikuje, binesazîya şoreşê hedef digire, pêşengên şoreşê qetil dike, li hemberî gerîla çekêن kimyewî û nukleer bikar tîne. Dengê azadîyê ji ku were berê lûleya xwe dide wir û dibêje "ez li hemberî terorê şer dikim" Çawa ku em pir baş dizanin, faşîzma Erdoxan ji bo berjewendiyê burjuvazîya Tirk, li hemberî gelê Kurd ê xizan, karker û kedkarên herêmê şer dike, Netenyahûyê sîyonîst jî ji bo berjewendiyê burjuvazîya Cihû-Yahûdî li hemberî gelên Filistîn û Lubnan şer dike. Her du jî van kiryarêñ xwe bi erêkirin û daxwaza emperyalîstan pêk tînin. Ji ber vê yekê em wek ciwanê Kurdistanê, êşa xwişk û birayêñ xwe yên Filistîn û Lubnanî parçeyek ji êşa xwe dibînin.

Dewleta sîyonîst a Îsraîl, bi hemû derfetên xwe li Xezayê komkujî pêk tîne, ev derbasî rojavayê Şerîa jî kir û komkujîya xwe, bi sûîqastêñ li herêmê jî berfirehtir kir. Vê jî têr nekir şerê bejahî, derbasî axa Lubnanê kir. Li peytaxta Lubnanê pêşengên berxwedanê hedef girtin û bi wan ra

bi hezaran mirovîn sivil jî qetil kirin. Bi êrîşa ku bi teqandina cîhazan dan destpêkirin, di şer da qonexeka nû vekirin.

Hedegirtina fermandarêñ Hizbûlahê, gihaşt heta Hesen Nasrallah û hîna jî berdewam dike. Lê li hemberî van êrîşen bêpîvan jî gelê Filistînê, pêşengên gelên Filistîn û Lubnanê tu carî paş da gav navêtin. Pêşengên li ser axa xwe, di nav şert û mercen şer da ji bo welatê xwe şehadet ji xwe ra kirin hedef, bi vî rengî bûn nemirên azadîya Filistîn û nemirên têkoşîna Rojhilata Navîn a azad û demokrat.

Lê em ji serî da dizanin ku her du desten emperyalîzma rojavayî yên di herêma me da dixwazin şer berfirehtir bibe û di herêmê da tu der ewle nemîne. Her çiqasî, bi gotin şerê hevdû bikin jî, Netanyahû û Erdoxanê ku hev dişibînin Hîtler, di esasê da nefsa hev in û hêzên ji derveyî NATOyê dikişînin nav şer da. Êrîşen Îsraîlê yên ku bi rêya MOŞAD dimeşîne û Îranê hedef digirin, ji serî da vê jî xwe ra dike armanc. Lewma Îran, bi "sebra stratejîk" nêz dibû û xwe ji şer di-parast.

Li vir em dikarin bînin ser ziman ku Komara İslâmî a Îranê ya Melelî, rejîme-ka paşverû û dijî azadîyê ye û di herêmê da şerê serdestîyê dimeşîne ye. Di vî alî da şerê Îranê jî şerekî bêmaf e. Lê tevgerên neteweyîyên gelên Rojhilata Navîn li hemberî dewletên NATOyê bi Îranê ra tevdigerin û piştgirî distînin, ev rewşeka fehmbar e. Piştî kuştina serokêñ Hamas, Hîzbûlah û fermandarêñ Muhamîfîn Şoreşê Îran, mecbûr ma ku bersiva êrîşen Îsraîlê bide. Em bawer in ku wê ev bi xwe ra deriyê şerên hîna mezintir û berfirehtir veke. Ji ber ku ev şerên ku îro diqewimin, me ber bi şerê 3emîn ê parvekirina cîhanê ya emperyalîst ve dibin.

Pergala kapîtalîst, gihaştiye dawîya emrê xwe û wek îxtiyarek cirnexweş, berîya mirinê dixwaze heyfa xwe ji jîyanê bistîne. Ev şer, di serî da li hemberî me, ciwan û jînêñ ciwan tê meşandin. Her tişt li alîyekî, yên ku di cepheyan da şer dikin û dimirin em in, yên ku kar dikin û jîyanê ava dikin em in. Em ciwanê gel ê feqîr in. Zarokên dewlemendan ji şer û birçî-

bûnê bê agahî, jîyana xwe ya bextewar dijîn; lê em, ciwanêñ gel, rojane di nav şer da ne. Bi taybetî jî ciwanêñ Rojavayê Kurdistan û Bakur Rojhilatê Sûriye, hem li dijî dewletên dagirker û çeteyêñ wan, hem jî li dijî şerê wan ê taybet rojane di nav şer da ne.

Ew me, bi pêdiwîyên jîyana rojane, bi stran û dîmenan, bi hisbir û koçberîyê, bi zewac û hwd. mijûl dikan û ji rojeven şoreşê dûr dixin. Wateya şer û şoreşê ji bo me tune dikan, bedelên ku hatine dayîn bi me didin ji bîr kirin. Û dixwazin em ji şerê ku li dora me û li ser me tê kirin bê agahî bimînin, wextê xwe vala bikujin. Ji bo ku em armancêñ şerê wan nas nekin û bi hêsanî bibin leşkerêñ wan an jî nikarin li hemberî wan xwe biparêzin, li ser me şerê taybet dimeşînin û têkoşînen gel tînin hemberî hev.

Di serî da pêwîst dibe ku em wek ciwanêñ gel rastîya şerên di herêmê da baş nas bikin û bizanibin ku ka kî şerekî mafdar dimeşîne û kî li hemberî wê şerekî bêmaf dimeşîne. Divê em li hemberî şerê emperyalîstan, şerê burjuvazîyan xwedî hişmendî bin. Ew dixwazin em ji welatê xwe, ji şoreşa xwe birevin û bi hêsanî bibin leşkerê wan. Divê em li welatê xwe bimînin û xwe rêxistin bikin. Ew dixwazin me bi hisbir bê xîret bihêlin, bi birçîbûnê mijûl bikin û li ser erdên şoreşê ji şoreşê dûr bixin.

Pêwîst e em jî hîn zêdetir di nav şoreşê da xwe bi cih bikin, şoreşê derbasî nav malên xwe bikin. Ew, gelê Filistînê wekî terorîst bi me didin nasîn, me jî wek dijîminê İslâmî bi gelên Filistînê didin nasîn û dixwazin di nav gelên bindest da têkoşîna yekgirtî neyê rêxistinkirin. Li hemberî vê, pêwîst e em hîna zêdetir yekîtiya têkoşînen gel bikin rojev û bi gel bidin nasîn. Ev şer bi giştî, jî her alîyê ve li ser ciwanêñ gel bi taybet jî li ser jînêñ ciwan tê meşandin û li hemberî vê jî yekane çareserî, rêxistinbûn e. Çawa ku em dibêjin "ciwan pêşeroj e, pêşeroj sosyalîzm e", pêwîst dibe em bi vê berpirsiyartîyê pêşengîji civaka xwe ra bikin. Ji ber ku dê an ew bi ser bikevin û koletîyê ferzî me bikin, an jî em ê bi serkeftinê azadîyê dîyarî nifşen du xwe bikin.



## Dagirtina Cihê Ku Ji Nemiran Vala Bûye

Di têkoşîna 30 salî ya partîyê xwe da me gelek hevrêyên xwe ber bi nemiriyê ve oxir kir. Banga ku her şehîdêkî/ê me ji me ra hişt “me derbas bikin hevrêno” bû. Ji bo ku em serkeftina şoreşê dîyarî gelê xwe bikin divê em guh bidin vê bangewazîyê. Ji karwana şehîdên wekî hevrê Erdal Balci yê ku di sala 1994an da yekem car li ser cisirekî peywir girt ser milê xwe, heta hevrê Dilşêr Rênasê ku li enîya Til Temirê ji bo parastin û mezinkirina şoreşê gavekê jî be nesekinî gelek waneyên ku em jê fêr bibin hene.

Partîyê me ji bo bîranîna hevrê Erdal Balciyê ku di 4ê Mijdara 1994an da di pêvçûna ku bi dijmin ra ketîye da bû nemir meha Mijdarê weke meha şehîdan ûlan kir.

Dema ku em li şehîdên xwe yên ku di demên cuda da ber bi nemiriyê ve oxir kirine dinêrin, em bîryardarîya têkoşînê, dilsoziya partî û şoreşê ya xurt a yekî/ê ya wan dibînin. Ev helwest hevrêyan derdixe pêş. Em kesen li paş mane û yên ku dê cihênu jî wan vala bûne tije bikin, gelo em ê ji şehîdên xwe çawa fêr bibin? An jî em ê ji hevrêyên ku daneheva wesf û tecrûbeyên cuda bi dest xistine çi bistînin? Divê fîrbûna jî şehîdan jî bo me komunîstan weke sozeka ziwa nemîne. Yek ji erkên me yên herî girîng ew e ku divê em di jîyana xwe da vê weke pratîk bi cih bînin. Di heman demê da wê ev li hemberî kemasî û têrnekirinê me jî rexnedayîna herî xurt be.

Di nava têkoşînê da yên ku ji me zû nemir dibin hebin jî meşa me ya şoreşê didome. Pêdivîya dagirtina çeperên ku hevrêyên me yên şehîd vala bûne, berpirsiyartî û erkên li ser milê me zêde dike. Heyama ku em tê ra derbas dibin, hewce dike ku ji bo paşve venegerînê em keşfîyan bişewitînin bi awayekî hîna xurtir têkoşînê hemêz bikin.

Hevrê Baran Serhed, Ehmed Şoreş û Yılmaz Behrareşê ku ji kadroyên rîber ên partîyê me bûn û ji alîyê dewleta Tirk a faşîst ve hatin qetilkirin. Van hevrêyan tecrûbeyên têkoşîna şoreşerî ku di oxira wê da emrê xwe nezir kirin da bi prafîkên xwe ra kirin yek. Divê em jî wan ci fêr bibin? Wan zindan, şkence û îxanet jî dîtin. Di heman demê da kêfxweşîya

têkoşîna şoreşerî û hevrêtîyê jî tije tije jiyyîn. Di gelek qadêن şoreşerî yên politîk a leşgerî da tecrûbe bi dest xistin. Tevlî xebatêن rîexistinî û çalakîyên pratîkî yên şoreşerî bûn. Her tim xwe bi nezirbûnê rapêçandin û bawerîya xwe mezin kirin. Ligel wan li axêن şoreşa Rojava pratîkîn bi dehan hevrêyên wekî Ferhad Erebo, Metîn Dîcle û Zîlan Destan ji bo me mînak e.

Hevrêyên ku di têkoşîna şoreşerî da navê xwe bi rûmet nîvîsandin, weke şoreşerî nehatin cîhanê. Piştre fêr bûn. Têkoşîna şoreşerî weke jîyanekê ji xwe hilbijartîn. Ji bo pêdivîyên vê yekê ked dan. Li hemberî kemasî û têrnekirinê xwe têk neçûn. Bi israr û ûnâd erkên xwe yên têkoşînê hemêz kirin. Vê bawerî û pabendbûna bîhêz di her qonaxeka dijwar da ew gaveka din derxistin pêş. Em jî bêyî gîlîkirin, qazinkirin û bi dûr sekinîna ji ramanê ferdperest xwe bidin têkoşînê, em dikarin cihênu ku hevrêyan vala hiştîye dagirin. Tişte herî bingehîn ê ku divê em ji hevrêyan fêr bibin israr û bîryardarîya di têkoşîna rîexistinbûyî da ye.

Weke hevrêyên ku li paş mane û têkoşînê didomînin, divê em ji hevrê Baran û Ferhad, ji hevrê Şîrîn û Berçem, ji hevrê Firat û Koray fêri dîsîplînê bibin. Mîrasê têkoşînê ya hevrê Sarya, Elîşêr, Mazlûm û Roza ji me ra banga “xwe derbas bikin hevrêno” ye.

Hevrêyên ku nemir bûne di bin her şert û mercê da ji bo serkeftina partîyê bi awayekî rîexistinî tevgerîyan. Bi dîsîplîn û birêkûpêk bûn. Bêyî hilbijartîna erkên biçûk an jî mezin hewl dan ku hemû erkên xwe bi awayekî herî baş pêk bînin. Bi awayekî xurt û bicoş tevlî têkoşîna şoreşerî bûn. Li hemberî êrîşen faşîst bêyî ku paşve gav bavêjin, li gorî pêwîstîya erkan tevgerîyan û bi ser ketin. Divê em jî ev pratîkîn wan ên şoreşerî ji xwe ra mînak bigirin. Hevrê Kutsîye Bozoklar, Baran Serhed, Ehmed Şoreş û Yılmaz Behrareş ji bo ku xwe bi pêş bixin xwendin ji xwe ra kiribûn erkekê. Weşanên partîyê, pirtûkên Marksîst-Lenînist, weşanên şoreşerî xwendin û lêkolîn kirin û daneheva xwe ya şoreşerî afirandin. Wê demê, ji ku em jî serkeftî bibin, ji bo ku em serwerîya

nêrînê partîyê û nezerîya Marksîzm-Lenîzmê bi dest bixin divê em ji dema xwe bi xwendinê hîna baştı binirxînin. Bêyî derbaskirina kîslanîya di mijara xwendin û fîrbûnê hîna zêdetir meşyane ber bi pêş da zehmet e.

Hezkirina gel û hevrêyên xwe ya şehîdên me gelekî xurt bû. Yen ku li dijî hevrêyên xwe hezkirineka wan a xurt nîn e, dûrî bedêdayîna ji bo hevrê û partîyê xwe disekinin. Hevrêyên me yên ku me ber bi nemiriyê ve oxir kirine li dijî dijmin tu carî bes nekirin.

Şehîdên me yên ku di têkoşîna me da kedeka mezin dan, di nava têkoşînê da hezkirin jî, hevrêtî jî, kedkarî jî di nava têkoşînê da watedar kirin. Derveyî têkoşîn û partîyê tu fikir û xeyalên wan ên jîyana takekesî ya wan tunebû. Gelo ya herî xweş û watedar di nava têkoşîna şoreşerî da bi jîyâna heman êş û zehmetîyan ne parvekirina jîyanê ye. Gelo ji bo me yên ku ji hemêza bi mîlyonan xizanên bindest derketine û hatine, derveyî jîyaneke rîexistinkirî û têkoşîna şoreşerî pêşerojeka cuda dibe? Divê her hevrê bizanibe ku ev nikare pêkan be.

Hevrêyên ku ji bo mezinkirin û serkeftina têkoşînê canê xwe fida kirin waneyên gelekî dewlemend ku em jê mînak bigirin ji me ra hiştin. Niha di meheka Şehîdân a Mijdarê da em di şopa şehîdên xwe têkoşînê mezin dîkin. Erka ku dikeve ser milên me fîrbûna ji israra têkoşînê û jîyana şehîdên me ye. Bîrbanîna hevrêyên me yên ku dema ki li çiyayên Kurdistanê, li enîyen Rojava, li axa Tirkîye û Ewropayê têdikoşîyan şehîd ketin, ji bo rabûna bi erka wan û gîhandina serkeftinê berdewamkirin e.

Partîyê me pişti şehadeta hevrêyê me ev gotin kir û banga “Baranbûyîn” ji hemû hevrêyân ra kir: “Partîyê me bi qasî ku yekîneya fedayîyane, şitilgeha Baran Serhedan e. Ev şitilgeh wê her tim zîndî bimîne.” Peyva “Baranbûn” disîplîn, hêvî, vîn, dilsozi û bawerîyeka xurt a bi dozê ra pêwîst dike. Dema ku em bi awayekî bê berjewendî xwe bidin têkoşînê, wa wê demê em dikarin bi fîrbûna jî hevrêyan cihê ku je ber hevrêyan vala bûye dagirin.

# TKŞ: Em li Dijî Mêtingehkarî, Dagirkerî û Şer Têkoşîna Yekbûyî Mezin Bikin

Tevgera Komunist a Şoreşger (TKŞ) li ser bangewazîya 1-7ê Cotmehê ya hefteya çalakîyê ya kordînasyona enternasyonal a rêxistin û partîyen Şoreşger (ICOR) li bajarêن Bakur û Rojhilatê Sûrî çalakî çekirin. Di çalakîyên ku ji gelê cîhanê ra piştgirîkirina gelên Rojhilata Navîn hate kirin da al û seyananen ICOR, TKŞ û JKŞ hatin rakirin.

dewletên hêzên emperyalîst û dewletên paşverû yên herêmê jî şirikên êrîşen Îsraîlê ne axafitina xwe wiha berdewam kir; “Tayîp Erdoganê faşist û Netanyahûyê faşist heman bi heman zimanê şer diaxivin. Dewleta Tirk a Mêtingehkar ciye Îsraîla siyonistjîrew. Ewdîktatorên dagirker, mêtîngehkar û faşist in. Dewletên faşist desthilatdarîyên xwe bi



## QAMIŞLO

Li Qamişlo endamên TKŞê ji bo piştgirîya gelên Filistîn û Lubnanê çalakî çekir. Di çalakîyê da alên TKŞê û seyananen bi îmzeya ICORê hat rakirin, dirûşmeyen “Bijî Berxwedana Rojava”, “Bijî Berxwedana Filistîn” hate avêtin. Di çalakîyê da endamê TKŞê Ronî Qamişlo axîfî. Ronî Qamişlo di ahaftina xwe da suîqestên li dijî rîberên berxwedana Lubnan û Filistînê şermezar kir.

Ronî Qamişloyê ku bal kişand ser êrîşen dewleta Îsraîlê ya dagirker ên piştî hemleya berxwedana ku di 7ê Cotmeha 2023an da dest pê kir wiha axivî; “Li Xeza dibistan, nexweşxane, mizgeft û baregehê penaperan bombebaran kir û bi deh hezaran mirov qetil kir. Niha dixwaze heman kiryarênen xwe li ser axêن Başûrê Lubnanê pêk bîne. Zor li gelê Lubnanê tê kirin ku bibin koç bikin”. Ronî Qamişlo anî ser ziman ku dewleta Îsraîlê li ser dagirkerî, pêdeçûn û komkujiyan hatîye avakirin û tekez kir ku gelê Lubnan û Filistînê li dijî dagirkerîyê têkoşîneka stemkar didin meşandin. Ronî Qamişloyê ku di dewamîya ahaftina xwe da bal kişand ku

xwînê xwedî dikan.”

